



Benckirina epîdural di dema neştergerîyê de û piştî neştergerîyê

Ev belavok rave dike ku eger tu ji bo kêmkirina êşê di dema neştergerîya xwe de û piştî wê epîduralekê hilbijêrî çî tê hêvîkirin. Ew ji aliyên bijîşka bencê, nexweş û nûnerên nexweşan ku bi hev re dixebitin hatiye nivîsandin.

Danasîn

Belavok van xalan rave dike:

- Epîdural çî ye
- çî demê tê bikaranîn
- çima tu dikarî jê ji bo neştergerîyeke xwe sûd wergerî
- ew çawa dixebite û tu dikarî çî hêvî bikî
- metirsî û biryargirtina hevpar.

Epîdural çî ye?

Epîdural, cureyeke benckira herêmî ye ku tê de tûpeke nerm û elastîk (sonda) li piştî te bi cih dike ku bi rêya wan benckirên herêmî û dermanên kemkirina êşê dihên dayîn. Pir caran ji bo kêmkirina êşê di dema zayînê de tê bikar anîn.

Di neştergerîyê de (bi benckira gelemperî an jî bêtî anestefîk) an jî piştî neştergerîyê dikare êşê bi rê ve bibe, an jî di her du rewşan de jî.

Dikare sonda piştî neştergerîyê di piştî te de bimîne û dikare ji bo zbaştîkirina kêmkirina êşê te were bikar anîn. Di hin pompeyên epidural de bişkojek heye da ku hûn bi xwe kêmkirina êşa xwe diyar bikin. Ev pompe ji bo kêmkirina îhtîmala ku tû dermanên êşê zêde nedî xwe di nava wan de sînorên ewlehiyê hatine bernamê kirin û fîma nêrîna tenduristiyê dê çavdêriya te bi rêk û pêk bike.

Epiduralek pir caran dikare bi serê xwe an bi anesteziyekê gelemperî re ji bo emeliyatên cihêreng were bikar anîn, wek mînak, emeliyata penceşêrê (bi taybetî penceşêra pişa spî) û urolojiyê (mîna gurçik û mîzdank).

Feydeyên epîdural çi ne?

Ji bo hin operasyonan, epidural ji rêbazên din çêtir kêmkirina êşê peyda dike, nemaze dema ku hûn nefeseke kûr digirin, dikuxin an di nav nivînan de tevdigerin.

Rêbazên din ên sivikkirina êşê morfîn an dermanên mîna wan bikar tînin (opioîd). Ev dermanên êşêkujê bihêz in, lê ew dikarin bibin sendemên hin bandorên alî ku di nav de levbûn, xewixîn, zikgîrî û bengînî (heke ji bi demeke dirêj bê bikaranîn) hene. Gava ku ji bo kêmkirina êşê morfîn tê dayîn hin kes gêj dibin .

Di heman demê de hin delîl hene ku hebûna epîdûral tevliheviyên din ên neştergeriyê kêmkirina êşê dike, di nav de kêmbûna xetera guvîna xwînê di lingan an pişikan de, enfeksiyona sîngê, û hewcedariya veguheztina xwînê..

Gelo herkes dikare bibe xwediyê epîduralekê?

Tenê ji bo hin neştergerîyan epîdural guncaw e ku meriv wê derbasbike û ji bo hin nexweşan jî nayê bidestxistin. Ger hewce be anesteziyê te vê yekê bi te re gotûbêj dike. Dibe ku epîdural ji te re ne gengaz be heke:

- tu dermanên tenikkirina xwînê, wek warfarin dixwî
- xwîna te bi rêkûpêk nayê guvîn
- alerjiya te li hember benckira herêmî heye
- te şewandek xeternak a stûnê heye
- di pişta te de enfeksiyonek heye
- te berê neştergerî li ser pişta xwe bi bicihkirina metalan di pişta te de derbaskirîye.

Epîdural çawa tê kirin?

Epîdural dikare bînin danîn:

- gava ku tû bi tevahî hişyarî
- bi amûşkirin (dermanên ku te dixwe û rehet dikî).

Wê anesteziya/ê te bi te re danûstandin bike ka kîjan rêbaz ji te re ya herî baş e. Bi gelemperî gavên ji bo wergirtina epîdural ev in:

- Bijişkê bencê an alîkarê wî dê monîtoran an jî her amûreke din ku li gor hewcedariyê girê bide da ku rêjeya lîdîna dilê te, fişara xwînê û asta oksîjîna bipîve
- ji bo dayîna şilekê derzî kanûleyek (dilop) di damarek destê te de tê danîn
- dê ji te were xwestin ku tû rûnî an li kêleka xwe xwe dirêj bikî.
- ji te re bibe alîkar ku tû bi pêş ve xwe xwar bikî, pişta xwe bi qasî ku tû dikarî xwar bikî – li jor binêre
- bijîşka bencê dê pişta te bi antîseptîk paqij bike
- derzîkirinek biçûk a benckira herêmî tê dayîn da ku çerm bitevîzîne
- derziyek tê bikaranîn ku sondakê têxin pişta te. Derzî tê rakirin, tenê sonda li cihê xwe dimîne, bi bandekê tê girêdan. Di hin rewşan de dibe ku hin hewldan pêwîst bin
- Sondaka mîzê bi gelemperî tê danîn da ku mîzê ji mîzdanka te derxe dema ku te epîduralek heye. Bijîşka bencê te dikare vê yekê bêtir bi te re nîqaş bike.

Hesteke çawa bi te re çê dike?

Derziya penca di çerm de dikare bi demeke kurt hinekî laşê we bişewitîne. Dê wê hingê hesta dehfdanê çêbibe, lê bi gelemperî ji ber ku derzî û sonda tîbî bîcîhkirin dê tenê hêsta nerehetiyê bi were çê nebe.

Carinan, hestek tûj, mîna şokeka elektrîkê, tê hîs kirin. Heger ve çê bibe, ew ê ji bo anestazîkerê we diyar be lê divê tû dîsa jî wan agahdar bikî. Ew dikarin ji te bipirsî ku te ew li ku derê laşê xwe hîs kir.

Pişî ku penca pêşî tê dayîn bi rêya sondekê, hêdî hêdî hesteke germbûn û pûçbûnê çêdibe. Ji bo hin cureyên epîduralê, dibe ku lingên te giran bibin û tevgerîna te zehmet bibe. Ev normal e.

Bi gelemperî, gelek mirov van hestan wekî xweş pênase dikin. Dema ku epîdural were rawestandî hest û tevger dê vegere rewşa asayî. Di hin rewşan de dibe ku çend hewldan hewce bin da ku sondaya epîdural li cîhê rast were danîn.

Nirxandina berî niştergeriyê ya klînîkê (berî nirxandinê)

Heger niştergerîyeke te ya plankirî hebe dibe ku tû berî çend hefteyan an rojan ji neştergeriyê boklînîkek nirxandina pêş-operasyonê werin vexwendin . Carinan, ji bo pirtir niştergerîyên piçûk, peresdarek dê ji bo ku hin pirsan ji te bike bi te re bi telefonê biaxive.

Ji kerema xwe van tiştan bi xwe re bîne:

- Lîsteke dermanên we yên heyî an dermanên we yên di pakêtên wan de tev îl pakêtên wan digel xwe bîne
- ger hûn dermanên ku xwîna we rohnê dikin werdigirin, girîng e ku fîmê pêş-nirxandinê bizane û nîqaş bike ka gelo hûn hewce ne ku hûn xwarîna van dermanan berî emeliyatê rawestînin.
- hemû agahîyên te yên li ser testan û dermankirinên te yên li nexweşxaneyên din
- agahîyên li ser pirsgerêkên ku tû an malbata te bi benckirinê re derbas kirine
- pîvanên fişara xwînê ya herî dawî.

Tu dikarî li klînîkê bi bijîşkeke bencê re hevdiîtinê bikî. Heke na, tû ê roja niştergerîya xwe li nexweşxaneyê bi bijîşka bencê ra hevdiîtinekê bikî.

Metirsî û biryara hevpar

Benckirên nûjen pir ewledar in. Hin bandorên alî ên hevpar ên dermanên anestezîyê an amûrên ku tîne bikar anîn hene, ku bi gelemperî ne ciddî ne an demdirêj in. Rîsk dê li gor kesan de cûda bibe û dê bi prosedur û teknîka benckirê(anestezî) ve girêdayî be.

Hin metirsîyên hevpar ên bi epîduralê re têkildar hene ku di nav de:

- fişara nizm ya xwînê
- zehmetiya derketina mîzê
- xwîna çerm

- nexweş hestkirin

- Serêş.

Di kêma rewşann de epîdural dikare bibe sedema zirara siniran ya demkî an mayînde.

Anestazîkerê te dê bi te re li ser talûkeyên ku ew bawer dîkin ku ji te re girîngtir in gotûbêj bikin. Ew ê tenê metirsîyên ku kêmtir hevpar in nîqaş bikin heger ew têkildarî te bin.

Heke tû dixwazî bêtir hûrguliyên li ser metirsîyên bi benckirin re têkildar in bixwîn, ji kerema xwe biçin ser: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages

Biryargirtina hevpar

Biryargirtina hevpar piştrast dike ku mirov têne piştgirî kirin da ku biryarên ku ji bo wan rast in werbigirin. Ew pêvajoyeke hevkarîyê ye ku bijîşkek piştgirîya nexweşekî dike da ku derbarê dermankirina xwe de bigihîje biryarekê.

Di axaftinê de wiha tê gotin:

- pisporîya bijîşkî, wekî vebijêrkên dermankirinê, delîl, metirsî, û sûd

- tiştên ku nexweş baştir dizanin: tercîhên wan, şert û mercên kesane, armanc, nîrx û bawerîyên wan.

Bo agahîyên zêdetir: www.england.nhs.uk/personalisedcare/shared-decision-making

Li vir hin amûr hene ku hûn dikarin bikar bînin da ku bi baştirîn şêwe sûdê ji nîqaşên bi anestezişt an xebatkarên nîrxandina pêş-operasyonê re bikin werbigirin:

Hilbijartina çarçoveya Wisely UK BRAN

Vê yekê wekî bibîxistinekê bi kar bînin da ku hûn li ser dermankirinê pirsan bipirsin.

https://bit.ly/CWUK_leaflet

NHS sê pirsan dipirse

Dibe ku di derbarê çavdêriya tenduristîya te de hilbijartin hebin.

https://bit.ly/NHS_A3Qs

Navenda Çavdêriya Pêşniştergeriyê (CPOC)

CPOC anîmasyonek hilberandîye da ku biryargirtina hevpar rave bike.

www.cpoc.org.uk/shared-decision-making

Pirsên ku dibe ku tû bixwazî bipirsî

Heger pirsên te derbarê benckirê xwe hebin, wan binivîse (tû dikarî mînakên jêrîn bikar bînin û yên xwe li cîhê jêrîn zêde bikî). Heger tû dixwazî rojekê berî niştergeriyê bi bijîşkekê bencê re bipeyivî, bi koma nîrxandina berî niştergeriyê re têkeve têkilîyê da ku ji te re derfetê saz bike ku tû bi telefonê bi pisporê bencê re biaxivî an wan di klînîkê de bibînin.

1. Çima tu ji min re epîdural pêşniyar dikî?

2. Banderên Erênî û bandorên neyînî yên epîduralê ji bo min çi ne?

3. Alternatîv çi ne?

Destjêkişandin

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran jî alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tên çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta ji dest tê tên venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ji me re bêje ka tu çi difikirî

Ger şîroveyên te hebe, ji kerema xwe wan jî vê e-mailê re bişîne : patientinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anaesthetists

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Şeşemîn, Pûşpera 2023

Ev belavok dê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nixxandin.

© 2023 Royal College of Anaesthetists

Dibe ku ev belavok jî bo çêkirina bûltena agahiya nexweşan were kopî kirin. Ji kerema xwe, çavkanîya orjînal binivîsin. Heke tû dixwazî beşek jî vê belavokê di weşaneke din de bikar bîni, divê destûreke guncaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahîyên zêdetir, ji kerema xwe bi me re têkevin têkiliyê.